Hunermendê şêwekar Dara Mihemedelî: Firçe û rengên xwe, dike gule û bi dijminî ve diteqîne

Xelîl Duhokî

Hunermendekî navdarê kurd e. Eve ji sîh salan pêtire ku bi germî dixebite û cihek taybet di nav qada hunerê kurdî û cîhanî de heye. Ew di sala 1950-ê de, li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye. Di sala 1974-ê de, diplom bi hunerê şêwekariyê, li Bexdayê wergirtiye. Ew endamê Sendîka Hunermendan, Rojnamevanan û Komeleya Şêwekarên Iraqê ye. Yek ji damezrînerên çend bingeh û geleriyên kurdî ye, mîna geleriya Erbîlla, , geleriya Zamo û bingehê Karê Destî li Hewlêr û Silêmanyê… Di gelek govarên kurdî de, wek nîgarkêş kar kiriye û wênên çendîn pirtûkên perwerdê jî efirandine… Çend pirtûk berhev û çap kirine.

Wî hin dîtinên huneriyên taybet hene. Me viya hizra wî li ser hin peyvan bizanin û wî jî, bi vî rengî bersiv da û got: *" Xodîk, hesp, pît, çav û kelepor" bi şêweyekê gîştî, di nav karên min yên hunerî de, sîmbol û hîmayên derbirîneka taybet in, ji bo (Haleteka taybet), mîna aliyên saykolojî, rehendên estetîk û ciwaniyê, civakî, bihayên kultur û keleporê kurdî …*

Di pênava bi destxistina kar, berhem û hunerekê kurdî yê hevçerx û modêrn.
Peyva "Xodîk" di navbera ronahî û tariyê, başî û xirabiyê, xweşî û nexweşiyê, geşbînî û reşbîniyê de, kêşa jiyaneka bêdawî ye.
Her wesa "Hesp", ji bilî ciwaniya wî, candarekê pir sûdbexş e jî, lê li cem min, helçûn, berxwedan, berdewam bûn û heval e…"

Tabloyên wî, ji rengên ciwan, hestên nazik û dilveker pêk dihên. Ew pir girêdayî dîroka gelê xwe ye û dixawaze di rêya tabloyên xwe de, dastan û çîrokên kurdî, zîndî bike ve û tabloya dastana Şor Mihmûd û Merzin giyan, ya Mem û Zinê, baştirîn nimûnên efirandinên wî yên serketî ne…

Şor Mehmûd û Merzin giyan

Ew hunermendek welatparêz e û doza gelê kurd, di nav xwîna wî de ye. Ji lewre jî, hemû jiyana xwe, ji bo pêşxistina wê meselê terxan kiriye û firçe û rengên xwe, dike gule û bi dijminî ve diteqîne. Li ser hebûna gelê kurd, ziman û olên kurdî dipeyive û dibêje: "*Yek ji binemayên serekiyên netewa kurd, bi rex erd û dîrokê ve " ziman e". Evca bi karanîna pîtên " zimanê kurdî, elfabeya latînî, zerdeştî û kurdiya berî musilmantiyê" bi şêwe û formeke modern, di nav karekî hunerîyê şêwekarî de, ji bilî aliyê rewşenbîrî û keleporî, aliyê ciwanî û estetîka, dide ber çav û bêdera hunerê şêwekariyê, dewlemendtir dike."*

Belê; ew berî her tiştî mirov e û xemên mirovî wî dorpêç dikin. Lê azar û xemên jinê, wî dagîr dikin û bi hêza tabloyên xwe, berevaniyê ji doza wê dike û dixwaze barê wê sivik bike û bigehîne pileyên bilindtir, di şaristaniyetê de… Hemû rûdan û karesatên cîhanê, di nav çavan de dibîne û hemû çavan jî, di yê xwe de, himbêz dike… Ew diyardeya "çavî" bi vî rengî şirove dike û dibêje: *"Diyarde û hêma "çavî" , çavek, du, yan jî zêdetir, çi ji meselê naguhire û di hindek haletên taybetiyên min de, hemû jiyanê, di nav cavekî de, di nav çavê xwe de, dibînim."*

Ew hunermendek bi nav û deng e û beşdarî di dehan pêşangeh û festîvalên kurdî û cîhanî de, li Hewlêr, Silêmanî, Duhok, Kerkûk, Riwandiz, Koyê, Bexda, Urdin, Polonya, Elmanya, Japon û Korya Başûr, kiriye. Di wan pêşangehan de, bûye sefîrê welatê xwe. Xem û derdên gelê xwe yê bindest, gehandîne gelek aliyên cihanê û bi wê çendê, şiyaye rola xwe bilîze û azarên welatê xwe yê wêrankirî, dante ber çavên xelkê wan welatan û pişteyaniyê ji bo doza gelê kurd peyda bike…